 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 16**

# Keştiya Tofanê û Çiyayên Kurdistanê di Tewratê da

## Çîroka Pêkhatinê li gor Tewratê:

Çîroka *Tofanê* di gotûbêja tewratî da bi teoriya pêkhatinê (afirandina cîhanê) ya tewratî va girêdayî ye. Ka em wê bi kurtahî bînin ber çavan:

Di destpêkê da ava deryayê rûyê zemînê bi giştî digirt, û di roja yekem da Xweda ronahî afirand û cudahî xiste navbera ronahî û tarîtiyê. Di roja duwem da asîman ji zemînê cudakir. Di roja sêhem da hişkî ji deryayê cudakir û şîndarên têvel afirandin. Di roja çarem da stêrk û exter, roj û şev afirandin. Di roja pêncem da tilûr, jîndarên ku dixuşin û yên ku li ser pêyan dimeşin afirandin. Di roja şeşem da mirov li gor wêneyê xwe afirand, mirov kirin nêr û mê (mêr û jin) û her tiştê li ser zemînê, çi şîndar û çi jîndar, xiste xizmeta wan. Di roja heftem da Xweda ji kar bihna xwe veda û ew roj kire rojek pîroz[1].

Xweda li rojhilat bihuştek li *Eden (iden)* çand, *Adem* afirand û ew xiste nava wê bihuştê. *Dara zanîna xêr û şer* di nawenda bihuştê da bû, ji *Aden* çemekî hildiavêt û bihuşt avdida. Çar liqên wî çemî hebûn: Yê yek *Fîşûn*فِيشُون , yê duwem *Cîĥûn*جِيحُون , yê sêhem *Ĥidaqil* حِدّاقِل (Dijle) û yê çarem *Ferat*. Xweda ji *Adem* ra xwarina hemû fêkiyên darên bihuştê rewa kiribû ji bilî fêkiyên *dara zanîna xêr û şer*. Daku *Adem* ne bi tenha serê xwe be û bê heval be, Xweda ji parsiyeka wî *Ĥewa* afirand û ew bû kebaniya wî[2].

Ji jîndarên kovî *mar* ya here hîlebaz bû. Baweriya *Ĥewayê* bi wê yekê anî ku ji *dara zanîna xêr û şer* bixwe. Wê jê xwar û baweriya *Adem* jî pê anî ku ew jî jê bixwe. Piştî ku wan xwar, dîtin ku ew tazî ne. Rabûn ji tirsa Xwedê ra, xwe bi pelên dara hejîrê sitirandin. Helbet Xweda zanî ku *mar, Ĥewa û Adem* çi kirine; nehlet li *mar* anî û biryar da ku dijminahiyeka hemdem di navbera nifşê *mar* û nifşê *Ĥewayê* da bimîne. Li ser *Ĥewayê* jî biryar da ku ew di anîna zarokan da êş û azarê bikişîne; û malxiyê wê li ser wê serwer be. Li ser *Adem* jî biryar da ku ew bi dirêjahiya temenê (jiyê) xwe cefakar be[3].

## Çîroka Tofanê ya tewratî:

Li gor Tewratê nifşên *Adem* û *Ĥewa* pir bûn. "Xweda dît ku şerê mirovan li ser zemînê pir bûye. Her raman û tiştê di dilê wan da, her roj şerxwazî ye. Xweda ji kiryara xwe xemgîn bû

ku mirov danîn ser zemînê. Ew di dilê xwe da, li xwe mikur hat û poşman bû. Xweda got: Ev mirovên ku min afirandine, bila ji ser rûyê zemînê rabin; mirovan, sewalan, jîndaran (yên ku dimeşin) û tilûrên li asîman. Ji ber ku, li ser tiştê ku min kiriye, ez xemgîn bûme"[4].

*Nûh kurê Lamek* ji senseleta *Şît kurê Adem* bû. Ew bawermendekî pîroz bû. Lê belê gendelî û fîtneyên mirovan pir dibûn, zemîn tijî zordarî bûbû. Rabû Xweda *Nûh* agahdar kir ku wî biryar girtiye qela mirovan bi *Tofanê* bîne, ji ber asêbûna wan û gendeliyên wan. Jê xwast ku ew keştiyeka mezin ji daran durist bike û ew hînî awayê duristkirina keştiyê kir. Jêra pîvanên keştiyê jî çespandin (300 gaz dirêjahî, 50 gaz firehî û 30 gaz bilindahî). Ferman da wî ku ew keştiyê ji sê qatan çêbike ew bi xwe ra kebaniya xwe, zarokên xwe li gel kebaniyên wan û ji her jîndarekî du liban yek nêr û yek mê bi xwe ra siwar bike. Û ferman dayê ku xureka (xwarina) ji wan ra pêwîst têxe keştiyê. *Nûh* ew tiştê ku Xweda ew pê ferman kiribû pêkanî[5].

Dema temenê (umrê) *Nûh* bû şeşsed sal *Tofan* pêkhat. *Nûh* û kebaniya wî, zarokên wî û kebaniyên wan û li gel wan û ji her jîndarekî du lib (cotek) ketin keştiyê. Kaniyên zemînê der bûn û baranê bi xurtî çil roj û çil şevî lêkir, av pir bû û pêlan li pêlan da. Avê da ser hemû çiyayên bilind jî bi 15 gazan. Xweda hemû heyber têkbirin, ji bilî yên ku di keştiyê da bûn[6].

Di pey ra Xweda ferman da ku kanî hişk bibin û baran raweste. Piştî 150 rojî av kêm bû û keştiya *Nûh* li ser çiyayê *Araratê* (Agirî) rawestiya û kopên çiyan êdî xuyakirin.

Piştî çil rojî, *Nûh* kulekek (taqek) di keştiyê da vekir û qirikek şand, lê ew vegeriya. Di pey ra kevok şand, ew jî vegeriya, ji ber ku ti cih nedîtin ku lê dakeve. Piştî heft rojan careka din kevok berda. Ew vegeriya û di nikulê wê da pelekî zeytûnê yê kesk hebû. Hîngê *Nûh* zanîbû ku av li ser zemînê kêm bûye. Piştî heft rojan dîsa kevok cara sêhem berda, ew çû û nema vegeriya. *Nûh* dît ku av vekişiyaye û erd ziwa (ziha) bûye. Xweda ferman da ku ew û mirovên li gel wî teve jîndaran ji keştiyê derkevin. *Nûh* gorî (qurban) ji jîndaran ji bo Xweda pêşkêş kirin. Wisa mirovayetiyê meşa xwe ji cihê ku keştiya *Nûh* lê daketibû destpêkir; yanê ji herêma çiyayên *Ararat*[7].

Derbarê navê *Nûh*, Dr. Seyid Mehmud El-Qimni dibêje ku navê qehremanê *Tofanê* di hin gotûbêjên Samiyan da "*Tanoah*"e تَجْنُوَح , û ew di Tewratê da bi kurtahî bûye "*Nûh"(Noah)*نُوَح[8]. Lêkolîner Owen F. Tomlin dibêje ku navê qehremanê *Tofanê* li ser perçeyek kevir bi zimanê ĥerranî, bi nivîskî, bi awayê "*Nah-Molet*" hatiye dîtin. Heger me hesabê wê yekê kir ku bajarê "Ĥerran / Ĥaran / Ĥowran / Horan) yek ji bajarên Horiyan yên girîng bû, ev tê wê maneyê ku çîroka *Tofanê* li ba Horiyan jî naskirî bû. Bi herhal, gelek gengaze ku navê "*Nûh*" (*Noah*) yê îbranî û "*Nûĥ*" yê erebî di bingeha xwe da navekî horî be; Îbraniyan bi awayê "*Noah*" û Ereban jî bi awayê "*Nûĥ*" biribin. Em ji bîr nekin ku malbata pêximber *Îbrahîm* (bapîrê Îbraniyan li gor Tewratê) di bingehê da ji Ĥeranê (Haran) bû[9].

## Nasnameya çiyayê Ararat çi ye?

Navê "*Ararat*" di kopiya Tewratê ya erebî da bi awayê "*Ararat*" hatiye. Bi kurdiya nûjen jêra "Agirî" tê gotin, yanê "çiyayê agir", ji ber ku kopên wî volkanî ne. Wisa tê xuyakirin ku di demên kevin da volkan çalak bûye. Bi zimanê Ermenî ji vî çiyayî ra "*çiyayê Masîs*" dibêjin. Bi turkî jî dibêjin "ağri dağ", yanê "çiyayê Agirî". Helbet ev ji şêwazê kurdî birine. Çiyayê *Ararat* (Agirî) li bakurê Kurdistanê dikeve. Ew bi dirêjahiya dora 40 km li sînorê navbera Turkiya, Ermîniya, Îran û Azerbeycanê ye. Ew di warê erdnîgarî da ji du beşan pêktê: Agiriyê mezin, bilindahiya wî 5137 metro ye û Agiriyê biçûk, bilindahiya wî dora 3896 metro ye.





Herêma çiyayê Agirî û derdorên wî ew herêm bi xwe ye ku pêşiyên Kurdan (Horî, Xaldî, Manî û Mîdî) lê rûniştibûn, pêş ku Faris padîşahiya Madan sala 550-î b.z. dagîr bikin. Heya niha jî Kurd li piraniya herêmên wî rûniştine, tevî ku beşek ji wan bi encama siyaseta sazûmanên serdar bûn Ermen, Faris û Turk. Ji ber ku Kurdistan dagîrkirî û beşkirî ye, herêmên wê li gor dewletên ku ew beş dagîrkirine tên naskirin û Agirî jî yek ji wane.




Dîmenek ji çiyayê Agirî

Navê "*Ararat*" ji navê "*Ûrartû*" yê kevin hatiye girtin; li gor gelê "*Ûrartû*", û ew gel bi xwe gelê "*Xalî, Xaltî*" ye. Ev nav Xaldiyan bi xwe bi şêwazê "*Halitu-in*" li xwe kiriye. Yanê gelê "*Xweda Xeldî*" (*Aldî*). Bala xwe bidin nêzîkahiya navbera "*Aldî*" û xwedayê Horiyan "*Addaw*" û "*Adû, Adî*" yê ayîna Êzdîtiyê. Xaldiyan ji welatê xwe ra digotin "*Biyaynîlî*" û Aşûriyan ji hin beşên welatê Xaldî ra digotin "*Nairi*". Ev herêm herêma Şemdînane li nawenda Kurdistanê (başûr-rojhilatê Turkiya niha). Ev nav di zimanê kurdî da bi şêwazê "*Nehrî*" maye ku paşnavê Şêx Ûbeydullahê Nehrî (reveberê şoreşa kurdistanî ya sala 1880-î) li gor vî navî ye[10].



THE FEDERATION OF BIAINILI (URARTU), NINTH - SIXTH CENTURIES B.C.

Di sedsala 13-an b.z. da padîşahê aşûrî *Shalmaneserê Yekem* welatê x*aldî* (başûrê Mûşê, bakurê Wanê, rojavayê Gola Ûrmiyê) talankir û nav lêkir "*Ûrû atrî*". Ev nav paşê bi şêwazê "*Ûrartû*" hate guhartin[11]. Em bawerdikin ku peywendiya vî şêwazî bi navê (*Ĥorî, Horî, Owrî*) ra heye. Herdu dîroknas Arnold Tuwenby û William Langer dibêjin ku *Xaldî* neviyên Horiya ne. Horî ji herêmên *Ûrartû* da li dora sedsala 18-an b.z. belav bûne. Dewletên ûrartûyî-horî di sedsala 9-an b.z da bûne yek û padîşahî pêkanîne. Bajarê Tûşpa (Tushpa) wek paytext birine. Ev bajar li kenara rojhilat ya Gola Wanê dikeve[12].



Piştî têkçûna padîşahiya *Mîttanî* di sedsala 12-an b.z. da gelê *Hayasa* yê Hittît desthilatiya xwe da ser *Ûrartû*. Herdu dîroknasên grêkî (yûnanî) Herodotus û Strabo dibêjin ku Ermen berê ji rûniştivanên Balkanê bûn, û wan ji welatê xwe di sedsala 13-an b.z. da, di bin pestana êlên Illyrians da, koç kiriye. Wan avtenga Bosfor û Derdenêl derbaskiriye û gihîştine Asiya Biçûk (rojavayê Turkiya niha). Di sedsala 8-an b.z. da berê xwe dane rojhilat, ber bi bilindahiyên çemê Ferat û gihîştine herêmên Dijleyê, û ewe ew herêm ku bi navê "*Ararat*" hate naskirin[13].

Wisa, bi zelalî tê xuyakirin, ew erdnîgariya ku keştiya *Nûh* ya tewratî lê dahatiye û mirovayetiyê ji wir destpêkiriye ji nû va şaristaniyê damezrîne, erdnîgariya kurdistanî ya kevin û ya nû ye.

Çarşemb, 15.07.2015

## Jêder

[1] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 1, Ayat 1-34.
[2] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 2, Ayat 1-24.
[3] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 3, Ayat 1-24.
[4] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 6, Ayat 1-7.
[5] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 6, Ayat 8-22.
[6] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 7, Ayat 1-24.
[7] Heyama kevin, rêwîtiya pêkhatiyê, Ashah 8, Ayat 1-22.
[8] Seyid Mahmod Al Qimni: Çîroka Pêkhatinê, rûpel 53.
[9] A. W. F. Tumlin: Fîlozofên Rojhilat, rûpel 118.
[10] Wilhelm Gernut: Hori, rûpel 100. Cemal Reşîd Ehmed: Xuyabûna Kurdan di dîrokê da, 2/131-134.
[11] Cemal Reşîd Ehmed: Xuyabûna Kurdan di dîrokê da, 2/131-133.
[12] Arnold Twenby: Diroka Mirovayetiyê, 1/160. Cemal Reşîd Ehmed: Xuyabûna Kurdan di dîrokê da, 1/164, 2/131,132. William Langer: Berfirehiya Dîroka Cîhanê, 1/87.
[13] Merwan Al Mudewer: Ermen di nava dîrokê da, rûpel 103, 104, 106. Hadi Rashid Al Jawishli: Bermaya Erbîlê ya dîrokî, rûpel 20-21.